



PARASTINA XANÎYAN JI ŞEWATÊ



Norsk
brannvernforening


brannvernforeningen.no

DEDEKTORÊN MECBÛRÎ YÊN DÛ



Li her malê herî kêm di çatekê de lazim e dedektoreke dû hebe. Dema ku şewatek dest pê bike herî zû dedektorên dû we hişyar dike. Di odayên razanê de derî hatibin girtin jî lazim e hûn bikarin dengê alarmê bibihîsin. Bataryayên dedektoran lazim e salê carek were guhertin. Bi pêlkirina bişkova testê alarma dû kontrol bikin.

ALAVÊN VEMIRANDÎNA ŞEWATÊ



Li her malê lazim e xortoma şewatê an jî alava vemirandina şewatê hebe. Eger herdu jî hebin baştir e. Lazim e alavên vemirandina şewatê li ber dest bin. Şênîyên xanîyê lazim e cihê van alavan bizanin. Bi baldarî talîmatên bikaranîna van alavan bixwînin.

NEHIŞTINA ŞEWATÊ 1



Dema ku hûn beroşê bi kar tînin baldar bin. Dema çêkirina xwarinê we navber da, agir vemirînin. Alarma tifikê û alava ku bi awayekî otomatîk agirê tifikê vedimirîne bi kar bînin. Dema ku agir hilkirî be baldar bin. Dema ku hûn ji odayê derketin, mûmeke vêketî nehêlin. Lazim e mûm li nêzikî tiştên ku dişewitin neyê danîn. Xwelîyan li cihê ewle xalî bikin. Xwelîya germ neavêjin nav qutîya çopê.

NEHIŞTINA ŞEWATÊ 2



Dema ku hûn ji malê derdikevin an jî radizên makîneya cilşo û makîneya ziwakirinê bigirin. Tenê pisporên elektrîkê bila alavên we yê elektrîkê tamîr bike an jî dayne. Malzemeyên însaatê, qutîyên karton û hwd. dema ku şewat dest pê dike rê li ber mirovan digire. Tiştên ku dişewitin li merdîwan û garaja xwe nehêlin. Konteynirên çopê dûrî avahîyan daynin.

DEMA ŞEWATÊ LAZIM E EV WERIN KİRİN



1)XILASKİRİN:

Pê yeqîn bin ku herkes derketiye derve.
Derketin di nav dû re gelek talûke ye.
Derîyan bigirin. Ber bi cihekî ku we ji berê
de dest nîşan kiriye herin.

2)AGAHDARKIRIN:

Bi rêya hejmara telefonê ya 110 servîsa
agirvemirandinê anga îtfaiyeyê agahdar
bikin. Navnîşana tam a xaniyê ku dişewite
ji wan re bibêjin.

3)VEMIRANDIN:

Eger şewat ne gur be, bi xortom an jî
alava vemirandinê agir vemirînin. Xwe
nexin nav talûkeyê. Dû gelek toksîk e.

Li gor rewşê hûn dikarin rêza van
merhaleyan biguherînin. Serê her
wexteke dîyarkirî tatbîqatên şewatê
çêkin, da ku herkes her tiştê ku lazim e
bike bi awayekî pratîk bike.



Ev broşur, di malpera Sazîya Parastina Ji Şewatê ya Norwecê de zêdetir ji 30 zimanan hatiye belavkirin:
www.brannvernforeningen.no/brannsikker